# Jîn



Gelî xoşk u bira. Ez silava li we dikim êk u êk. Ez hîvîdar im jîaneka keyf u xuş biburînin.

Ez kiçkek Emrîkî me. Ez mamosta zimanê Inglîzî me. (Min masters bi "Teaching English as a Foreign Language" heye.) U ez dê bu we bêjim çawa Kurdî fer bîm.

Ji berî sêzde sala ez çûm devera Zaxo li gel rêkxistîekê (minezemekê); 15 heyva mam li wêrê. Ez li gel malekê ji xelkê Zaxo jîam. Min gelek divîa ez ziman u 'edetêt Kurdî fêr bim.

Min hindek kitêbêt zimanê Kurdî nivîsîn da Emrîkî fêrî zimanê Kurdî bin. (Ferhengê seḧ ke www.dcklci.com/dictionary.) U min jî sîdî bi zimanê Kurdî tumar kirin bu xwandinê.

Min têklîa gelek Kurda kirî ye, u ez gelek ḧeş li wan dikim. Dergehêt wana bu min vekirîne. Ez gel jinkêt wan diaxivim. (Axiftina min ne wek êke Kurde, bes ez ḧes dikim ez êk ji wan bim.) Ez digel biçîkêt hevalêt xu bisteh im. Bawerîa hevalêt min yêt Kurd gelek bi min têt. Ez digel wana çim dixtura u dezgeha bu tercimanîê.

Heker dawet an tazî hebin, ez li gel wan im. Wextê Xwidê biçîka dit hevalêt min, ez bi şulê destêt xu bu wan dîarîa çêdikim. Ez gelek harî karîa wan dikim.

Ez sê sala çûm Dihukê u Zaxo u Hewlêrê digel hevalêt xu yêt Emrîkî. Em dersêt zimanê Inglîzî bidîne xwîndikara. Her sal ez dersêt zimanê Kurdî dime Emrîkîa bu yêt divên zimanê Kurdî fêr bin.

Ev nivîsandina he li hindava dergehê li zanku University of South Carolina li Rojhelata Emrîke:

**Were fêr be, herre xizmetê bike.**

Ez du'a dikim ev nivîsandina he "Jîn" bi dilê her kesekê bit u xizmeta xelkê we bikim. Heker te divêt guvara "Jîn" belave bikî, kerem ke. (An bêje hevalêt xu îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com.) Hîvîdar im heyva bêt nivîsandinekî dî bu we binvîsim. U gelek supas.

Silavê min bu we ḧeta heyva bêt.
Xoşka we, Şirîn

Bawerîa min bi axiftina min naêt.

Bawerîa min ewe: ku ez çi dikim.

- Donald Miller (*Blue Like Jazz*, p. 110)


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

Jîn


Jimara êkê | Heyva Eyarê 2006 | Vercinye, Emrîke 

# Azadîa rastî çi ye?

[Mebesta vê parçê "Jîn" eve ye: min divêt hindek têbînîa bidim we da hîn pitir azadîa rastî nas kin.]

Li vê dumahîê gelek kes li ser dîmokrasîê diaxivin.

Her komelekê hindek azadîa rastî yê hey. Komela Kurda jî hindek azadîa rastî hene, bes hêş maî ye.




Dîmokrasîê pişkekê ji azadîa rastî ye. Belê azadîa rastî çî ye?Bi kar înana dîmokrasîa rastî, ewe ku Xwidê xêr daîme, çunku her kesekê li ser dinyaê Xwidê xêrek digel kirî ye – u pêtivî ye her êk ji me ew xêra Xwidê daîye bi kar bînîn digel êk u dû. Belê pêtivîê em bizanîn ka çawa wê azadîa rastî bi rengekî berfire kar bînîn.

Bu numune, Xwidê xêr li gel min kir u ez fêrî zimanê Kurdî bim u bibime mamosta. Bu min gring e ez xizmeta xelkê bikim da ez wê xêrê kar bînim u harî karîa xelkê bikim. U da şerim bit bu min heker ez wê xêrê bu xizmeta xelkê bi kar neînim u bu xu bi tinê bihêlim. U ji ber hindê min çend kitêbêt Kurdî nivîsîne da xelkê ẍerîb bişên Kurdî fêr bin u harî karîa Kurda bikin.

Her êk ji we pêtivî ye bawerî bi xu hebit u xêrê bu êk u dû bixazin. Ne bes bi axiftinê. Bi karî. Çunku her kesekê tiştekê taybet heye u pêtivî ye ew tiştê taybetîe xizmeta kesêt dî bikit.

Dîar bike azadîa rastî bi karê xu ew xêra Xwidê daî te. Bi karê xu yê baş tu dê gehî azadîa rastî u dê bînî ka çawa tête bikar înan. U pişkek azadîa rastî hebit.

"Amujgarîê nîşa zanaekê bide. Dê zanîyarîêt wî pitir lê êt. Yê rastgu fêr bike dê zanînîn wî pitir lê êt."

- (Pertuka Gutinêt Pêẍember Silêmanî 9:9)

# Xwizî

Xwizîkêt wanêt bi ruḧê dihejar, çunku paşatîa esmanî bu wane.

Xwizîkêt wanêt xembar, çunku dê êne dilşadkirin.

Xwizîkêt kesêt sernerim, çunku ew dê erdê destve înin.

Xwizîkêt birsî u têhnîêt başîê, çunku ew dê êne têrkirin.

Xwizîkêt diluvana, çunku dê diluvanî ête rêka wan.

Xwizîkêt dilpaqija, çunku ew dê Xwidê bînin.

Xwizîkêt aştî çêkira, çunku dê bêjine wan kurrêt Xwidê.

Xwizîkêt wanêt ji ber dilpakê tepeser dibin, çunku paşatîa esmana bu wane.

Xwizîkêt we dema ji ber min, we kirêt u tepeser diken u ji drew ve hemî rengêt xirab bi we vedin. Dilşad u bextewer bin, ji ber ku xelatê we li esmana yê mezin e çunku wan husa pêẍemberêt berî we jî tepeser dikirin!

- 'Îsa (Mizgînîa Mettî 5:3-12)

"Jîn" guvareke têtê nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

**Jîn**

Jimara êkê | Heyva Eyarê 2006 | Vercinye, Emrîke 

# Elif Bê

’ ‘**Î**raq 

A, a **a**gir 

B, b **b**erx 

C, c **c**ami’ 

Ç, ç **ç**ar **4**

D, d **d**eh **10**

E, e **e**nişk 

Ê, ê **ê**k **1**

F, f **f**êqî 

G, g **g**ul 

H, h **h**eşt **8**

Ḧ, ḧ **ḧ**eft **7**

I, I **I**stralîe 

Î, î **î**prax 

J, j **j**ijî 

K, k **k**iras 

L, l **l**eymîn 

M, m **m**eymînk 

N, n **n**eh **9**

O, o **o**de 

P, p **p**ênc **5**

Q, q **q**elew 

R, r **r**îvî 

S, s **s**ê **3**

Ş, ş **ş**eş **6**

T, t **t**emate 

U, u **u** **&**

Û, û **dû** **2**

V, v **v**exwarin 

W, w **w**erîs 

X, x **x**îar 

Ẍ, ẍ **ẍ**arîfk 

Y, y **y**azde **11**

Z, z **z**irrna 

“Jîn” rujnameke tête nivîsîn ji laê Şirînê.  Heker te jimara rujina bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn.  All rights reserved.  This publication may not be sold, except by the author.  It is for free distribution only.